

Ez pê re me!

Jugendmigrationsdienst JMD - Xizmetkariya Koçberên Ciwan- alîkariyê dide min, da ku ez bikaribim di nav civata elman de, di nav xwendingeh û dibistanê de û her wuha di nava jiyana çandî û civakî de bi awayekî serketî xwe entegre bikim - xwe bi cih bikim.

Ew sazî, desteke ku ez pê bawer im dide min, bi awayekî dîrûdirêj alîkariya min dike. Amojkarên/şewirmendên

Jugendmigrationsdienst JMD - Xizmetkariya Koçberên Ciwan - bi min re di derheqa kanîn û qabîliyetên min de her wuha di derbarê wê yekê de diaxifin, ka ez di kîjan warî de xurt im û ka kîjan daxwazî û xwestekên min hene. Ew amojkarên saziyê bi min re planê dikin, gelo kîjan gav bi yek û yek bêne avêtin û her wuha kîjan aktîvîte û çalakî di warê pêşvexistina entegrasyonê de bîna lidarxistin. Ewana ji bo pêkhatina van gavan di pratîkê de alîkariya min dikin. Ew şewirmendî/şîretdayin û destekdayin ji bo min belaş in.

Ji bo ku ev armancên ku hatine tespîtkirin û bikaribin bigihêjin encamêkê, ez amade me, ku bi awayekî çalak/jêhatî bi hev re kar bikim. Ezê wan wazîfe û erkên ku em li ser axifin bi cih bînim, da ku ez karibim bi awayekî serketî têkevin di nav civaka elman de û da ku ez bi awayekî rehetî/aramî li Elmanyayê bijîm. Di vê yekê de ew yek jî heye: ezê ew randevû/termînan û lihevhatinên tesbîtkirî bi cih bînim. Heke di nuxteyê de pirsgrêk/problem derketin ên ku ez bi tenê nekaribim çareser bikim û ji ber wana ez nekaribim erk û wezîfaya xwe bi cih bînim, hingê ezê amojkarên/şewirmendên xwe li ser vê yekê agahdar bikim û her car ji wana alîkariyê rica bikim.

Daxuyaniya razîbûnê:

Ji bo plansaziya pêşvebirina entegrasyonê divê hinek agahiyên/daneyên şexsî bîna hildan û ew bîna bikaranîn, wek mînak: nav, tarîxa jidayikbûnê, mêr e an jin e? Di kîjan tarîxê de hatiye Elmanyayê? Ji kîjan welatî hatiye? û her wusa zewicî ye an jî na? Her wekî din, ew pirs jî bi taybetî tên pirsîn: agahî/daneyên ku divên bêne parastin, ên li ser tendûristiya min û ên di derheqa koka min a etnîkî de (li gor xala 3, 9 a BDSG).

Ew biryara di destê min de ye: gelo ew agahî/daneyên min ên şexsî bîna hildan û her wusa ew bîna bikaranîn. Heke ez ji bo hildayin û bikaranîna agahî/daneyan ne razî bim û di vê warî de min tu daxuyanî nedabe, hingê ew çênabe, ku ez bikaribim di nav plansaziya pêşvexistinê de cih bistînim. Dî halekî wusa de tenê ji min re desteka amojkariyê/şîretdayinê tê dayin.

Ez qebûl dikim ango pê razî me, ku **Jugendmigrationsdienst JMD - Xizmetkariya Koçberên Ciwan - a**

ew dane/agahiyên derbarê şexsê min de, ango ên li ser entegrasyona min a di warê zimên, dibistan, pîşe û her wuha warê civakî de, wana hilde û wana ta temenê min ê 27 salî bû, di nav komputer de veşêrîne û wana bi kar bîne. Veşartin û bikaranîna van dane/agahiyên tenê bi tenê ji bo pêşvebirina entegrasyonê ye.

Dane/agahiyên di derheqa min de bi şertûmercan ve girêdayî ne, ku ewana têkevin bin parastina daneyan û bi awayekî pêbawerî bîna bikaranîn. Lê, bes, JMD, hewceyê hinek xizmetkarên din e, ango bi kes û firmayên komputeran re dixebite, ên ku Hard û Softwarê çêdikin û li gor ferman û talîmatên JMD tevdigerin. Ew firma ev in: Firma Intevation GmbH (a ji bo çêkirina Software) û her wuha Firma Open-IT GmbH (Serverfirma). Ew firma jî divê dane/agahiyên veşêrin. Di her hal û karî de ew dane/agahiyên şexsî digel Jugendmigrationsdienst JMD - Xizmetkariya Koçberên Ciwan - dimînin.

Her tim û daîm îmkân û derfeta min heye, ku ez digel Jugendmigrationsdienst JMD - Xizmetkariya Koçberên Ciwan- bikaribim bibînim, ka kîjan dane/agahî di warê şexsê min de hatine hildan û ew tên bikarîn. Eva daxuyaniya ku nuha li ber çavan e, ez karim di her dem û çax de bi paş ve bikişînim.

Min ew daxuyaniya rizabûnê fêhm kir, li ser pirsên ku di serê min de bîna me deng kir.

Navê min: _____

Paşnavê min: _____

Navnîşan/li ku derê rûdine: _____

Kûçe û kolan: _____

Koda postayê/Cih û Bajar: _____

Cih, tarîx: _____

Binxeta/îmzeya wî mirovî ciwan
an jî a temsîlkarê wî